



## **EHR: Sunetkirina keçan li Herêmê dibe pirsê WHO**

EuroKurd Human Rights - EHR bi CHAK-Europa û hevkarîya dezgehên navnetewî mijarek giring dike cihê niqaşê: Li Herêma Kurdistanê sunetkirina keçên biçûk.

Li ser dosya taybetî, ji rêvebirîya EHR ê daxuyaniyek wisa hate belavkirin.

”Li ser mijarê bi hejmarek dezgehên navnetewî re hevkarîyek erênî pêk hat. Li gorî îstatîstîkan, qûrbanên sunetbûyî û nûçeyên belav dibin, li herêmê ji ber problema sunetkirinê, ji awira beden û rûhî ve birînên bêderman vedibin. Herêma Kurdistanê, ji aliyê hejmara kesên qûrban û pêşveçûna sunetkirina keçên biçûk, ber bi welatên Afrîkayê ve diçe.

Lewma EHR, di gel xwîşk û birayên hêja yên CHAK-Europayê û bi hevkarîya dezgehên navnetewî dest davêje pirsêk giring. Em dixwazin pirsê bikin cihê niqaşê û rê li ber vê hovîtiyê bigirin.

Li ser hejmara keçên sunetbûyî, mintîqeyên zêde ketine bin bandorê, analîza sunetkirinê û encamên ji aliyê beden û rûhî, û dîtina kesên qûrbanbûyî rastiya heye bêjin, bînine holê.

Em dixwazin eşkere bikin ku, kesên qûrbanbûyî pirsê dibin ber destê “Dezgeha Sîhetê ya Cîhanê-WHO” yê. EHR jî dê ji Hikumeta Herêmê daxwaz bike ku, bi rêyên qanûnî rê li ber sunetkirinê bigire. Her

wisa jibo raçavkirina pirsê komîsyonekê ava bike. Ji bo ghiştina armanca xwe, em ê ji aliyê navnetewî gavên pêwîst bavêjin...”

Dosya teybetî bi rêya malpera EHR ê [www.eurokurd.net](http://www.eurokurd.net) ê û ajansa Zarathustra News ê bo Medya Kurdî bê belavkirin.

Zarathustra News - [zarathustra\\_news@comhem.se](mailto:zarathustra_news@comhem.se)